



Herkesekî mafê daxwaza kirina penaberiyê heye.

BELAVOKA AGAHĪYAN JĪ BO PENAXWAZAN

Destpêkî hûn niha li Latviya ne. Latviya dewleteke ku endamê Yekîtiya Ewropayê li Rojhilata Ewropayê ye. Zimanê fermî Latviyayî ye.

Hûn dikarin ji bo penaberiyê daxwazekê tomar bikin, eger hûn ditirsin ku paş wegerîna ji welatê xwe yê xwemalî rastî zehmetê bên, û eger hûn nikarin ji welatê xwe bêne parastin.

Têbînî: **Herkesekî mafê daxwaza kirina penaberiyê heye.**

Li gorî zagona navnetewî herkesî mafê parastinê heye li dijî zordestiyê.

Li Latviya ragihandina nivîskî girîngiyeke mezin heye. Divê ku hûn her tişt binivîsin bi taybetî jî eger hûn daxwazekî ji rayedaran radest dikin. Herwisa, eger we her pirsgirêkek hebe, kerema xwe her tim hewl bidin ku wan bi nivîskî ragehînin. Hûn dikarin ev karî bi zimanê xwe yê zikmakî an bi her zimanê din, ku hûn diaxivin, pêk bînin.

Penaxwazî- penaberî û statûya alternatîf: (Eger we rewşek wisa hebe...)

Eger hûn welatê xwe ya xwemalî ji ber ku maf û azadiya we ya bingehîn di bin gefa cidî da ye, zordestî ji we hatîye kirin an hûn bin rîska zordestiyê de ne, dema vegeza ji welatê xwe ya xwemalî, ji ber regez, ol, netewe, rayên polîtîk an endametiya nava grûbekî civakî û eger dewleta we (hikûmet) nikanin yan naxwazin we biparêze, hûn dikarin penaberiyê li Latviya bistînin. Eger yek ji van şert û mercên li jor hatî baskirin, cem we hebe, tê statûya penaberiyê û destûra rûniştina daîmî li Latviya ji were bê pêşkêş kirin.

Eger hûn neçarin ku welatê xwe yê xwemalî terk bikin, ji ber ku jiyan, saxlemîya fizîkî an azadiya we li bin metirsiyê de ye ji be şerê çekdarî, şideta bi pergala li welat, dijminkariyê ji derve, binpêkirinên mezin ya mafên mirovan, yan hûn di dema vegeza ji welatê xwe yê xwemalî de rastî yek ji şert û mercên navborî li serî, bên, herwisa gengaze ku mafê penaberiyê li Latviya ji were bê pêşkêş kirin. Eger yek ji van şert û mercên li jor diyarkirî hebe, dê rewşeke alternatîf û destûra rûniştina demkî ji were bê pêşkêşkirin, ku her salê tê venêrin kirin.

Ji bo daxwaz kirina penaberiyê çi pêdivîye? Divê ji bo daxwaz kirina mafê penaberiyê bilez bi mentîqa gengaz bi nivîskî an jî bi devkî daxwaza penaberiyê bikin. Ev dikare di balafirgehê an jî benderan anku cihê ku digehîşinê, an her sînore din ku hûn derbas dikin, bibe. Herwisa dikarin piştî gehîştina Latviya daxwaza penaberiyê bikin. Dikarin daxwaza xwe radestî yek ji Parêzgeha Sinûrê Dewletê (li vir paşve SBG) yekîneya herêmî, nûnerên Nivîsgeha Hevwelatî û Karrên Koçberîya (OCMA), Polisên Parêzgehê (SP) yan ji Îdareya Girtîgeha (PA) bikin.

Hûn dikarin li her yek ji van saziyane de bi zimanê zikmakî an jî zimanê din ku hûn dikarin têkiliyê pê bikin, daxwaza penaberiyê bikin. Eger bi Inglîzî, Rûsî an jî Frensî diaxivin, ew baştîre ku hûn daxwaza xwe bi yek ji van zimanan pêşkêş bikin, Herwisa piraniya rayedaran dikarin bi yek ji van zimanan bipeyivin û dikarin bêyî werger fêm bikin. Lê belê, divê

derfeta hilibijartina zimanê ragihandinê ji were bê dayîn. Divê SBG, OCMA, SP an PA li ser her pêwîstiyên taybet (wekî nimûne rewşa fîzîkî an derûnîya we) bêne agahdar kirin. Ev çêtir e ku ev di vê rojê de be ku hûn daxwaz xwe bo penaberiyê pêşkêş dikin.

Têbînî. *Di hemû qonaxên pêvajoyê de we mafê bidestxistina agahîyan heye. Rayedarên dewletê berpirsin liser dabîn kirina agahîyan. Ji kerema xwe ji bo zelal bûnê ji wan bipirsin.*

Paşê çi? Di heman roja ku daxwaza mafê penaberiyê dikin an demeke nêzik piştî vê, we tê “hevpeyvîna destpêkê” hebe, ku SBG dê li ser daneyên we yên şexsî pitsan ji we bipirse, resma we bikêşe, û rêça tilfîyên ji we bistîne. SBG herwisa hinek pirsan ji bo destnîşankirina rewşên din a we ya şexsî tê bipirse. Divê hemû belge û hewandina ku dikarin nasname û neteweya we îspat bikin berdestê we da bin. Baştirîn berjewendiyên we tune kirina belgeyên şexsî nîne!

Têbînî. *Hemû belgeyên we pir girîng in. Ji kerema xwe ji wan biparêze.*

Her daxwazname ji bo mafê penaberiyê dê di nav 10 rojên xebatê de ji OCMA bê şandin. Eger daxwazname li dergehê sînor-deriyê an li herêma transît bê pêşkêş kirin, OCMA ewê di 2 rojên xebatê de tê verbigire.

Eger hûn li Latviya bin, nav 10 rojên xebatê de, eger hûn li dergehê sînor-deriyê an li herêma transît bin di nava 5 rojên xebatê de, OCMA tê biryarê bide ka lêkolîna daxwaza we bike an na. Eger we berê daxwaza xwe ji mafê penaberiyê li welatekî din ya Ewropa radest kiribe, OCMA dikare biryar bide ku daxwaza penaberîya ya li wir bimîne (jêre dibêjin pêvajoya Dûblîn ê) Eger pêwîst nebe ku hûn biçine welatekî din ji bo lêkolîna daxwaza penaberîya xwe, hingê hevpeyvînek girîng tê gel we bê kirin. (hûrtir ji hevpeyvîna seretayî) ku nûnerê OCMA pêk dîne. Di vê hevpeyvînê de hûn dikarin bêjin ku çi bi serê we qewimîye, çima û çawa hûn ji welatê xwe derketine û bi ravekirina sedemên ku hûn nikarin vegeerî wê derê. Ev hevpeyvîne di nava 2 mehan piştî ku OCMA biryara lêkolîna daxwaza we derbirî, pêk tê. Bi bîr bîne ku bi baldarî li ser tiştê ku di hevpeyvînê de dibêjin, bifikirin.

Têbînî. *mafê we heye ku bi zimanê ku têdîgehîşin têkilîyê bikin û bersivê bistînin û herwisa wergêrekî daxwaz bikin.*

Ji bo hemû pêvajoya daxwaza we ya penaberîyê de eger pêwîst be, dê wergêrek ji we re bê pêşkêş kirin. Eger we wergêr fam nekir, an jî eger we hîs kir ku wergêr kêrhatî wergêrî nake, divê hûn birêveberê fermî yê hevpeyvînê de vê derbarê de agahdar bikin. Herwisa dikare daxwaza guhertina wergêrî pêşkêş bikin.

Eger daxwaza we bê nirxandin, divê di nav 20 rojên xebatê de biryar bê dayîn (pêvajoya bi lez), yan jî di nava 3 mehan de (pêvajoya bi rêkûpêk) piştî roja ku hevpeyvîna we ya girîng, lê ne derengtir ji 6-15 mehan piştî roja ku we daxwaza xwe ji bo penaberîyê qeyd kir.

Di dema lêkolînan li ser daxwaza we, bi ihtîmaleke mezin li navenda pejirandina penaxwazan “Muceniki” (nêzikî Riga, li paytexta Letonya) yan jî cîhekî din, bêne bicihkirin. Eger hûn bêne binçavkirin, hûnê ji Navenda Rûniştina Kesên Biyanî re bêne veguhistin.

tevdîrên astengkirinê SBG desthilata bikaranîna tevdîrên astengkirinê heye, lê sedemên pêwîst bûnê zelal dike. tevdîrên astengkirinê pêk tên ji a) qeydkirina li yekîneyeke herêmî ya SBG û b) binçavkirin. Herwisa eger rayedar biryara tevdîrên astengkirinê ser we bisepînin, ew dê we bi nivîskî agahdar bikin û bi zimanê ku hûn fêm bikin tê sedema vê ji were aşkere bikin. SBG herwisa dê we agahdar bikin ku çawa li hemberî biryara tevdîrên astengkirinê daxwaza venêrinê bikin û herweha li ser gengazîya daxwaza alîkariya zagonî û nûnertîya belaş (çawa alîkariya belaşa zagonî bistînin). Eger hûn dixwazin alîkariya zagonî ya belaş bistînin, divê hûn daxwazekî pêşkêşî SBG bikin. SBG daxwaza alîkariya zagonî ya we ji bo Rêveberîya Alîkariya Zagonî (anku dezgehên ku berpirsin liser dabînkirina alîkariya zagonî) dişîne. Herwisa dikarin daxwaza alîkariya zagonî ya belaş ji rêxistinên ne-hikûmî yê herêmî bikin (listeyê di dawîya vê belavokê de bibînin).

Alîkariya zagonî weke penaxwazek mafê we heye ku bi xercê xwe parêzerekî we hebe. Bi vî awayî, ev girîng e ku di pêşîyê de hûn li ser xercê zagon gel parêzerekî lihev bikin. Eger

we kê m dirav heye an we qet dirav tune ye, rengo bo alîkarî kirinê daxwaza penaberîya we ji Rêveberîya Zagonîya Belaş ya Dewletê re bê şandin. Li alîkarîya zagonîya belaş da dikarin liser biryarên Dadgeha Îdareya Herêma OCMA, gilî yê pêşkêş bikin. Eger dixwazin Alîkariya Zagonî ya belaş bistînin, divê daxwaza xwe ji SBG an jî OCMA re pêşkêş bikin.

Têbînî. Di pêvajoya damezirandê de, dikarin li dijî her biryar an kiryareke SBG an jî OCMA gilî pêşkêş bikin. Eger hûn dixwazî li hemberî biryara OCMA an jî biryara tedbirên astengkirinê gilî pêşkêş bikin, hûn dikarin daxwaza alîkariya zagonî ya dewletî bikin.

Piştî ku we biryara xwe stand, Hûnê biryara xwe ji OCMA bistînin.

Eve dikare bibe biryareke erênî (daxwaza penaberîya we bête qebûl kirin û bikarin bi statûya penaberîya (*bêglis*) an jî bi parastina kêlî (*alternatîvais status*) li vir bimînin. Eger hûn xwediyê statûya penaberîyê bibin, tê karteke nasnameyî ji were bête pêşkêş kirin, ku ji bo 5 salan nirxdar e, û eger hûn parastina kêlî bistînin, karteke nasnameyî ji bo 1 salê nirxdar e. Hûn dikarin alîkarîya tîbî bistînin dikarin herin dibistanê yan jî zanîngehê, û xizmetên civakî wekî gelê Latviyan bistînin. Herwisa we mafê xebatê jî heye. Hûn dikarin hewl bidin ku endamên malbata xwe cih bikin û ji wan bîne bo Latviya, ku jê re dibêjin ghiştina malbatî. Lê belê, divê hûn bizanibin ku ev pêvajoyek dirêj û aloz e.

Eger we statûya penaberîyê hebe, tê mehane heta 12 heman (yan 10 mehane li gel diravê alîkarîya du mehan di meha yekim da, eger heta dema ku hûn evê dixwînin, serrastkirina zagonê birêve çûbe) 139 EUR ji were tê pêşkêş kirin, eger we statûya alternatîf hebe, di dema 9 mehane de,) yan di dema 7 mehane li gel diravê alîkarîya du mehan di meha yekim da, eger heta dema ku hûn evê dixwînin, serrastkirina zagonê birêve çûbe. Xercê mehane ji bo endama/ê duyem an jî ya sêyem an jî ji bo kesên di bin 18 salan de, 97 EUR ye. Derfetek ji bo bibin welatîyên Latviyan heye. Eger we statûya penaberîyê hebe, piştî 5 salan dikarin bi rêya ku li zagonê hatîye danîn, daxwaza hevvelatî bûnê bikin. Eger we parastina kêlî hebe, piştî 10 salan dikarin daxwaza hevvelatî bûnê bikin.

Herwisa rengo biryarra neyînî bistînin (daxwaza we nehatiye pesend kirin). Eger biryara we neyînî ye û hûn guman dikin ku hûn nikarin ji ber hebûna xetereyê vegerin welatê xwe, hûn dikarin serî li dadgehê bidin daxwaza venêrinê bikin. Di vê rewşê de hûn dikarin daxwaza venêrîna biryara OCMA li dadgeha îdarî ya navçeyê de bikin. Bo ku OCMA yê ji qebûl kirina biryara xwe agadar bikin, yek meh (eger di pêvajoya lezgin de doza we hatibe venêrin kirin, 15 rojên xebatê) derfeta we heye. Bo gilî kirina liser biryarra neyînî, we mafê heye ku yarmetiyên zagonî yê belaş yê dewletê bikar bînin, Agahdarîyên giştî li ser çawanîya daxwaz kirina alîkariyên zagonî yê dewletî yê belaş dijî biryarra OCMA jî heye.

Têbînî. **Biryara OCMA biryara dawî nîne.** Eger hûn liser vê biryarê razî nînin, hûn dikarin di nava mehekê de yan jî di 15 rojên xebatê de bo pêvajoya venêrîna lezgin, daxwaza venêrinê li Dadgeha Îdarî ya Navçeyê gilî bikin. Merc di nava biryara me de hatine diyar kirin.

Ji kerema xwe ve baldarîya ev muhleta dawî bidin, piştî bidawî hatina derfetê, OCMA wisa difikire ku we biryara neyînî qebûl kirîye û tenê îmkana we nivîsîna daxwazek di ye. OCMA li pêvajoyek lezgin de, daxwaza duyem lêkolîn dike û bi tenê hebûna rastîyên nû an zanyarîyên ku berê nehatine behsa kirin, lêkolîn dike. Di daxwaza duyê de, dijiwartir dibe ku OCMA îqna bikin hûn hewcedarê parastina navnetewî ne.

Pêvajoya Dadgeha dikare ji 5 rojan het 3 mehane bidome. Eger daxwaza we ya venêrinê bête red kirin, pêvajoya penaberîyê de biqede. Pêvajoya vegera bo welatê xwemalî jî dest bê dîke û dersînor kirinê ji were tê derbirîn.

Encam Gengaz e ku her tişt bi heman rengî ku di vê belavokê de hatîye gotin, birêve neçe. Eger tiştêkî ne zelal e, an jî hûn difikirin ku mafê we re rêz nehatiye girtin, nabe hûn hêrs bin û divê tenê mafên xwe biparêzin û rewşa xwe gel berpirsyarê SBG an jî OCMA gotûbêj bikin. Di hemû rewşan de li gel rayedarên dewletê yan jî rêxistinên na-hikumî ku dikarin xizmetên zagonî ji bo alîkariya zagonî yê kêrhatî pêşkêş bikin, rabêj bikin.

Ji bo alîkariyê divê serdana çi cihan bikin?

Nûnertiya Herêmê ya Komîseriya Bilind a Neteweyên Yekbûyî ji bo Penaberan (UNHCR) li bakurê Ewropa

Ynglingagatan 14, 6th fl., SE-113 47, Stockholm, Sweden

Telefon.: +46 8 457 48 80

Feks: +46 8 457 48 97

E-mail: swest@unhcr.org

<http://www.unhcr-northerneurope.org>

UNHCR rêxistina navnetewî ku ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ji bo hevaheng kirina çalakiya navnetewî ji bo parastina cihanê ji penaberên û çareseriya pirsgirêkên penaberan hatiye damezirandin. Armanca sereke ya UNHCR ê, piştrast kirina maf û rehetiya penabera ne. UNHCR têdikoşe da ku herkes bikare daxwaza mafê penaberîyê bike û stargeha bi ewle li welatêkî din peyda bike, û bi dilxwazî vegere mala xwe. Hemû penaxwazan, penaber yan kesê di statûya alternatîf de maf hene ku li UNHCR ê re daxwazekî pêşkêş bikin.

Rêveberiya Alîkariya Zagonî

Juridiskās palīdzības administrācija

Pils laukums 4, Rīga, LV-1050

Tel.: +371 80001801, +371 67514208

Fax: +371 67514209

E-mail: jpa@jpa.gov.lv

www.jpa.gov.lv

Ji bo kesên ku nikarin bi xercê xwe, alîkarîya zagonî bistînin, alîkariya zagonî ya dewletê tê dabîn kirin.

Nivsîngeha Dawerî

Tiesībsarga birojs

Baznīcas iela 25, Rīga, LV-1010

Tel.: +371 67686768

Fax: +371 67244074

E-mail: tiesibsargs@tiesibsargs.lv

www.tiesibsargs.lv

Venêrîna liser gilîyên şexsî, radestkirin, pêşkêş kirina şêwirmendiya li ser pirsên mafê mirovan û çavdêriya pêvajoya dersînorkirina bitorê dîke.

Navenda Latviya ji bo Mafên Mirovan

Latvijas Cilvēktiesību centrs

Alberta iela 13, Rīga, LV-1010

Tel.: +371 67039290

Fax: +371 67039291

E-mail: office@humanrights.org.lv

www.humanrights.org.lv

Rêxistineke ne-hikûmî ya serbixwe ye ku alîkariya zagonî ji bona penaxwazan û koçberên nerêk li Latviya ya li ser bingehê projeya UNHCR pêşkêş dîke.

Civaka "Stargeha" House Safe "

NVO "Patvērums „Drošā māja”

Lāčplēša iela 75-9 / 10, Rīga, LV-1011

Tel.: +371 67898343 (تمنها له لاتقيادا)

+371 25565098 (bi Inglîzî)

E-mail: konsultacijas@patverums-dm.lv

www.patverums-dm.lv

Civaka Stargeha "House Safe" ji bo mexdûrên qaçaxa mirovan, koçberên qanûnî, penaxwaz, penaber û kesên parastina alternatîf li Latviya distînin, xizmeta piştgiriyê pêşkêş dîke.

Xaça Sora Latviya

Latvijas Sarkanais Krusts

Šarlotes iela 1 d, Rīga, LV-1001

Tel.: +371 67336651

Fax: +371 67336652

www.redcross.lv

Di nav tiştên din, şêwr, agahî, destek, cil û starê ji bo kesên di tengasiyê, de pêşkêş dîke.

Navenda Destpêşxer bo Jinê "Marta"

Biedrība Resursu centrs sievietēm "Marta"

Matīsa iela 49 – 3, Rīga, LV-1009

Tel.: +371 67378539

Fax: +371 67378538

E-mail: centrs@marta.lv

www.marta.lv

Alîkariya zagonî ya belaş, piştgirîya psîkolojîk û karkerên civakî ji bo jinê di Latviyan, Russian û Inglîzê de pêşkêş dîke.